BIRCA ÇAVDÊRIYÊ

PADÎŞAHIYA YEHOWA XWEDÊ ÎLAN DIKE

PADÎŞAHIYA XWEDÊ ÇI YE?



NAVEROK

3 “Bila Padîşahiya Te Bê” – Duaya bi Milyonan Însanan

4 Em Çima Hewceyî Padîşahiya Xwedê ne?

6 Padîşahê Padîşahiya Xwedê Kî ye?

8 Padîşahiya Xwedê wê Kengê li ser Dinyayê Hikum Bajo?

11 Padîşahiya Xwedê wê Çi Bike?

14 Piştgiriya Padîşahiya Xwedê Bike!

16 Padîşahiya Xwedê Çi ye?

BIRCA ÇAVDÊRIYÊ
PADÎŞAHIYA YEHOWA XWEDÊ ÎLAN DIKE

Cild 141, No. 6 2020 KURDISH KURMANJI
Hejmara Çapkirinê: 93.281.000
Hejmara Zimanan: 369

BIRCA ÇAVDÊRIYÊ pesnê Yehowa Xwedê dide. Ew Hikumdarê Gerdûnê ye. Ev kovar dilê însanan bi mizgîna xêrê rihet dike. Di demeke nêzîk de, Padîşahiya ezmanî wê xerabiyê ji kokê rake û dinyayê bike cenet. Wekî din, ev kovar bala mirovan dikişîne ser Îsa Mesîh. Wî canê xwe feda kir ji bo ku em karibin jiyana bêdawî bistînin. Ew niha Padîşahê Padîşahiya Xwedê ye. *Birca Çavdêriyê* ji sala 1879an û pê ve tê weşandin. Ev kovar li gor gotinên Kitêba Pîroz tê hazirkirin û tev li siyasetê nabe.

The Watchtower (ISSN 0043-1087)
May/June 2020

© 2020 Watch Tower Bible and Tract Society of PA.

Printed in Germany.
© Druck und Verlag: Wachtturm Bibel- und Traktat-Gesellschaft, Selters/Ts., V. i. S. d. P. Manfred Steffensdorfer, Selters/Ts.

ALMANYA:
Jehovas Zeugen
65617 Selters, Deutschland

TIRKIYE:
Yehova’nın Şahitleri
PK 37 Kartal 34870 İstanbul, Türkiye
Tel: 0216 504 46 36

Ji bo lîsteya adresên me, li www.jw.org/kmr-x-rd/irtibat binêre.

JW.ORG

Gelo tu dixwazî di heqê Kitêba Pîroz de sohbetê bikî? | Bikeve www.jw.org | yan jî daxwaza xwe bişîne yek ji adresên jorîn.

Ev weşan nayê firotin. Li seranserê dinyayê, fealiyetên me bi bexşan tên finansekirin (li donate.jw.org jî binêre). Eger wergereke din nehatibe nîşandayîn, ayetên Nivîsarên Pîroz ên Yûnanî û ayetên Zebûrê ji *ÎNCÎL (Mizgînî) û Zebûr* (*Mizgînî*, Çile 2009) hatine wergirtin; ayetên Nivîsarên Pîroz ên Îbranî yên ji xeynî ayetên Zebûrê ji *Kitêba Pîroz* (*KP*, Mijdar 2011) hatine wergirtin. Hin ayet jî ji *Wergera Dinyaya Nû* (*NWT*) hatine wergirtin.



“Bila Padîşahiya Te Bê”

DUAYA BI MILYONAN ÎNSANAN

“Bila padîşahiya te bê” (Metta 6:9). Li seranserê dinyayê, bi milyonan însan gotinên vê duayê gelek caran dubare dikin. Gelo çima? Çimkî Îsa Mesîh ji şagirtên xwe re gotibû ku bila ew ji bo Padîşahiya Xwedê dua bikin.

Di serî de, şagirtên Îsa Mesîh hin tiştên ku wî di heqê Padîşahiya Xwedê de gotibûn, fehm nedikirin. Carekê, wan ji wî pirsî ka ewê Padîşahiyê li wê demê saz bike yan na. Lê belê, Îsa Mesîh rasterast cewab neda (Karên Şandiyan 1:6, 7). Gelo ev yek tê maneya ku em nikarin bizanibin ku Padîşahiya Xwedê çi ye û ewê kengê bê? Na!

Ev kovara *Birca Çavdêriyê* cewabên van pirsên muhîm dide:

- Em çima hewceyî Padîşahiya Xwedê ne?
- Padîşahê Padîşahiya Xwedê kî ye?
- Padîşahiya Xwedê wê kengê li ser dinyayê hikum bajo?
- Padîşahiya Xwedê wê çi bike?
- Çima muhîm e ku em piştgiriya Padîşahiya Xwedê bikin?
- Padîşahiya Xwedê çi ye?

Em Çima Hewceyî Padîşahiya Xwedê ne?

Gava însanên pêşîn hatin xuliqandin, tenê Xwedê – yê ku navê wî Yehowa ye – Hikumdar bû. Hikumdariya wî pir baş bû. Xwedê li rûyê erdê baxçeyekî bedew çêkir ku însan tê de bijîn, û wî têr û tije xwarin da wan. Wekî din, wî di vê Cenetê de îşekî kêfdar da wan (1. Mûsa 1:28, 29; 2:8, 15). Eger însan di bin hikumdariya dilovan a Xwedê de bimana, jiyana wan wê pir xweş bûya.

Kitêba Pîroz – yanî Tewrat, Zebûr û Încîl – nîşan dide ku melekekî li hemberî Xwedê û hikumdariya wî serî hilda. Ev melek paşê wek Îblîs hat bi nav kirin. Wî got ku rêberî û hikumdariya Xwedê ne lazim e. Çi heyf e ku Adem û Hewayê guh da Îblîs û li hemberî Xwedê serî hilda (1. Mûsa 3:1-6; Peyxam 12:9).

Ji ber ku Adem û Hewayê hikumdariya Xwedê red kir, ew ji Cenetê hatin derxistin, û wan hêviya jiyana bêdawî winda kir (1. Mûsa 3:17-19). Qerara wan li ser zarokên wan jî bandor kir. Kitêba Pîroz dibêje ku seba gunehê Adem, "guneh ket dinyayê û ji guneh mirin hat" (Romayî 5:12). Wekî din, seba gunehê Adem, însanan dest bi hikumdariya li ser însanên din kir, û vê yekê kul û derdên mezin anîne meydanê (Waiz 8:9).

DESTPÊKA HIKUMDARIYA ÎNSANAN

Yek ji hikumdarên pêşîn, ên ku Kitêba Pîroz behsa wan dike, zilamekî bi navê Nîmrod bû. Nîmrod li hemberî hikumdariya Yehowa serî hilda. Ji rojên Nîmrod û pê ve, gelek mirovan qudreta xwe bi awayekî xerab bi kar aniye. Weke 3.000 sal berê, Silêman Padîşah got ku seba hikumdariya însanan, dinya bi zilm û zordariyê ve tije ye (Waiz 4:1).

Îro jî halê dinyayê eynî ye. Di sala 2009an de, weşaneke Rêxistina Neteweyên Yekbûyî got ku hikumdariya xerab "yek ji sebebên herî mezin ên problemên civakî" ye.

HIKUMDARIYEKE NÛ

Dinya bi rastî jî hewceyî hikumdariyeke baştir e, û Xwedê soz daye ku di demeke nêzik de, hikumdariyeke wisa wê li ser dinyayê hikum bajo.

Xwedê Padîşahiyeke ku wê cihê hemû hikûmetên dinyayê bigire û heta bi hetayê berdewam bike, saz kiriye (Danîêl 2:44). Padîşahiya ku bi milyonan însan di duayên xwe de behsa wê dikin, ew e (Metta 6:9, 10). Lê belê, Xwedê wê bi tena serê xwe hikum neajo. Wî kesekî din wek Padîşah hilbijartiye. Gelo kî?

Di bin hikumdariya Xwedê de, yekîtî û selamet hebû



Însanên pêşîn hikumdariya Xwedê red kir

Nîmrod li hemberî Yehowa serî hilda

Hikûmetên însanan çi qas xîret bikin jî, ew nikarin kul û derdên dinyayê safî bikin

Padîşahê Padîşahiya Xwedê Kî ye?

Wek Kitêba Pîroz ji berê de gotibû, Padîşahê Padîşahiya Xwedê ...

ji aliyê Xwedê ve hat hilbijartin: 'Ez im, yê ku padîşahê xwe, li ser çiyayê pîroz da rûniştin. Ezê wek mîras miletan, bi milkî çar kujên dinê bidim te' (Zebûr 2:6, 8).

ji zuriyeta Dawid Padîşah hat: "Xwedê wê textê bavê wî Dawid bide wî ... û dawiya padîşahiya wî nayê" (Lûqa 1:32, 33).

li Beytlehemê hat dinyayê. "Wî hemû serekên kahînan û Şerîetzan li hevdû civandin û ji wan pirsî, ka Mesîh wê li ku derê çêbe. Wan jê re got: 'Li Beytlehma Cihûstanê, çimkî bi destê pêxember weha hatiye nivîsîn'" (Metta 2:4, 5).

ji aliyê însanan ve hat red kirin û kuştin: "Biçûk hate dîtin û ji aliyê mirovan ve hate berdan ... Ji ber gunehên me birîndar bû" (Îşaya 53:3, 5).

ji mirinê rabû û hat bilind kirin: "Ew ne li diyarê miriyan hat hiştin û ne jî bedena wî rizîbûn dît. Îcar ew hatiye hilkişandin milê Xwedê yê rastê" (Karên Şandiyan 2:31, 33).

Îsa Mesîh Hikumdarê Herî Baş e

Eşkere ye ku ev ayetên Kitêba Pîroz behsa Îsa Mesîh dikin. Melekekî ji diya wî Meryemê re wisa gotibû: "Xwedê wê textê bavê wî Dawid bide wî ... û dawiya padîşahiya wî nayê" (Lûqa 1:31-33).

Îsa Mesîh li dinyayê nebû hikumdar, çimkî wî dizanibû ku ewê wek Padîşahê Padîşahiya Xwedê ji ezmanan li ser dinyayê hikum bajo. Gelo Îsa Mesîh çima Hikumdarê herî baş e? Van xisûsiyetên Îsa Mesîh bîne ber çavê xwe:

- **Îsa Mesîh xema mirovan dixwar.** Jin yan mêr bûya, ciwan yan extiyar bûya, feqîr yan zengîn bûya – Îsa Mesîh alî her kesî dikir (Metta 9:36; Marqos 10:16). Carekê, gava zilamekî bicuzam ji wî re got: “Eger tu bixwazî, tu dikarî min paqij bikî”, dilê Îsa Mesîh pê şewitî, û wî ew qenc kir (Marqos 1:40-42).

- **Îsa Mesîh rêyî me daye ku em çawa dikarin dilê Xwedê şa bikin.** Wî got: “Hûn nikarin xulamtiyê hem ji Xwedê re û hem jî ji dewlemendiyê re bikin.” Wekî din, wî got: “Her çi ku hûn dixwazin xelk ji we re bikin, hûn jî wusa ji wan re bikin.” Îsa Mesîh zelal kir ku Xwedê ne tenê kirinên me, lê dilê me jî dibîne. Loma, ji bo ku Xwedê ji me razî be, gerek em hiş û dilê xwe kontrol bikin (Metta 5:28; 6:24; 7:12). Îsa Mesîh got ku ji bo ku em bi rastî dilşad bin, gerek em daxwaza Xwedê rind fehm bikin û pêk bînin (Lûqa 11:28).

- **Îsa Mesîh maneya hezkirinê zelal kir.** Gotin û kirinên Îsa Mesîh dilê guhdarên wî digirt. Kitêba Pîroz wisa dibêje: “Elalet li hînkirina wî gelek şaş ma. Çimkî wî ne wek Şerîetzanên wan, lê wek yekî xweyî desthilatî ew hîn dikirin” (Metta 7:28, 29). Mesela, wî ji wan re wisa got: “Ji dijminên xwe hez bikin.” Bi ser de, wî ji bo hin kesên ku ew dikuştin, wisa dua kir: “Bavê min, li wan bibihûre, çimkî ew nizanin ku ew çi dikin!” (Metta 5:44; Lûqa 23:34).

Belê, Îsa Mesîh Hikumdarekî dilovan û dilrehm e. Gelo ewê kengê dest bi hikumdariya li ser dinyayê bike?

Padîşahiya Xwedê wê Kengê li ser Dinyayê Hikum Bajo?

Hin şagirtên Îsa Mesîh dixwest bizanibin ka Padîşahiya Xwedê wê kengê dest bi hikumdariyê bike. Îsa Mesîh ji wan re got ku ew nikarin wê rojê bizanibin (Karên Şandiyan 1:6, 7). Dîsa jî, wî ji wan re gotibû ku gava ew bibînin ku çend bûyer di eynî wextê de diqewimin, ewê "bizanin ku Padîşahiya Xwedê nêzik e" û wê êdî li ser dinyayê hikum bajo (Lûqa 21:31).

ÎSA MESÎH GOTIBÛ KU ÇI WÊ BIQEWIME?

Îsa Mesîh wisa gotibû: "Milet wê li hember miletan rabe, padîşahî wê li hember padîşahiyan rabe. Erdhejînên mezin wê çêbin û li cih cihan xela û êşa zirav wê derkevin" (Lûqa 21:10, 11). Wek xêzên şopa tiliyê, ev bûyer bi hev re nîşaneke zelal tînin meydanê. Çawa ku însan bi şopa tiliyê dikare bê nas kirin, ev yek ku hemû bûyerên ku Îsa Mesîh behsa wan kiribû di eynî wextê de tên meydanê rêyî me dide ku "Padîşahiya Xwedê nêzik e". Gelo bûyerên wisa di eynî demê de hatine meydanê û li seranserê dinyayê xuya bûne? Bala xwe bide van îsbatan.

1 ŞER

Di sala 1914an de, şerekî bêemsal dest pê kir. Gelek tarîxzan dibêjin ku sala 1914an destpêka demeke nû bû, çimkî wê salê, şerê cîhanî yê yekemîn dest pê kir. Di vî şerî de, tank, bombeyên teyareyan, tifingên otomatîk, gaza bijehr û çekên xedar ên din, cara pêşîn li her derê hatin bi kar anîn. Dû re, di şerê cîhanî yê duyemîn de, çekên nukleer cara pêşîn hatin bi kar anîn. Ji sala 1914an û pê ve, li gelek deran şer hene, û di van şeran de bi milyonan însan hatine kuştin.

2 ZELZELE

Li gor *Britannica Academic*, her sal weke 100 zelzeleyên mezin çêdibin, yên ku dikarin zerara mezin bidin. Wekî din, Navenda Lêgerîna Jeolojîk a DYA dibêje ku "li gor qeydên pirsalî (ji sala 1900î û pê ve), her sal weke 16 zelzeleyên mezin çêdibin". Hin kes difikirin ku bi eslê xwe, zelzele zêde nebûne, lê tenê zêdetir tên qeyd kirin. Dîsa jî, eşkere ye ku zelzeleyên mezin li her derê pir zerarê didin û gelek însanan dikujin.

3 XELA

Li seranserê dinyayê, tiştên wek şer, neqanûnîtî, krîzên ekonomîk, metodên şaş ên cotkariyê û felaketên tebîetê dibin sebeba xelayê. Di rapora ji bo sala 2018an de, Bernameya Cîhanî ya Xwarinê wisa dibêje: “Li seranserê dinyayê, 821 milyon însan birçî dimînin. Ji wan, 124 milyon însan pir birçî ne.” Her sal, kêmasiya xwarinê dibe sebeba mirina weke 3,1 milyon zarokî. Di sala 2011an de, weke ji sedî 45an ji zarokên ku li seranserê dinyayê mirin, jiyana xwe seba kêmasiya xwarinê ji dest da.

4 NEXWEŞÎ

Weşaneke Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê wisa dibêje: “Li sedsala 21ê, çend epîdemiyên mezin çêbûne. Nexweşiyên kevn wek kolera, weba û taya zer vegeriyane, û nexweşiyên nû wek SARS, grîpa pandemîk, MERS, Ebola û Zîka derketine holê.” Û pandemiya COVID-19 ya herî nû ye. Zanyar û doktor her çi qas di heqê nexweşiyan de gelek tiştan hîn bûne jî, çareya hin nexweşiyan hê nehatiye dîtin.

5 BELAVKIRINA MIZGÎNA PADÎŞAHIYÊ

Ji xeynî van bûyerên xerab, Îsa Mesîh behsa tiştekî baş jî kir: “Ev Mizgîniya Padîşahiyê wê li seranserê dinyayê bê dayîn, da ku ji hemû miletan re bibe şahidî û hingê dawî wê bê” (Metta 24:14). Li gel halê xerab ê dinyayê, zêdetirî 8 milyon mirovên ji hemû miletan mizgîna Padîşahiya Xwedê li 240 welat û herêmî bi zêdetirî 1.000 zimanî belav dikin. Di tarîxê de, tiştekî wisa tu caran neqewimîbû.

GELO MANEYA VÊ NÎŞANÊ ÇI YE?

Belê, nîşana rojên dawîn, a ku Îsa Mesîh dabû şagirtên xwe, îro li ber çavê me diqewime. Gelo maneya vê çi ye? Îsa Mesîh wisa gotibû: “Çaxê hûn jî bibînin ku ev tiştên ha çêdibin, bizanin ku Padîşahiya Xwedê nêzîk e” (Lûqa 21:31).

Bi saya nîşana ku Îsa Mesîh dabû û ayetên din ên Kitêba Pîroz, em fehm dikin ku Padîşahiya Xwedê di sala 1914an de li ezmanan hat saz kirin.* Wê demê, Îsa Mesîh ji aliyê Xwedê ve wek Padîşah hat tayîn kirin (Zebûr 2:2, 4, 6-9). Di demeke nêzik de, Padîşahiya Xwedê wê li ser dinyayê hikum bajo, hemû hikûmetên însanan ji holê rake, dinyayê bike cenet û fersendê bide însanan ku ew heta bi hetayê bijîn.

Belê, pêkhatina van gotinên Îsa Mesîh nêzik e: “Bila padîşahiya te bê. Daxwaza te wek li ezmên, bila li ser rûyê erdê jî bê cih” (Metta 6:10). Ji wexta ku Padîşahiyê di sala 1914an de dest bi hikumdariyê kir û pê ve, gelo serkeftinên Padîşahiyê çi ne? Gava Padîşahiya Xwedê li ser temamiya dinyayê hikum bajo, halê dinyayê wê çawa be?

* Ji bo zêdetir melûmata li ser sala 1914an, li kitêba *Heta Bi Hetayê Dilşad Be!*, ders 32 binêre (ji aliyê Şahidên Yehowa ve hatiye weşandin).

Di demeke nêzik de, Padîşahî wê daxwaza Xwedê li dinyayê pêk bîne

Padîşahiya Xwedê wê Çi Bike?

Îsa Mesîh ji şagirtên xwe re gotibû ku bila ew dua bikin ku Padîşahiya Xwedê bê. Wî dizanibû ku kul û derdên dinyayê ne ji Xwedê ne, û ku tenê Padîşahiya Xwedê dikare van probleman safî bike. Gelo Padîşahiya Xwedê wê çi bike?

SERKEFTINÊN PADÎŞAHIYA XWEDÊ

Li meqaleya berê, me dîtibû ku nîşana ku Îsa Mesîh dabû, li ber çavê me tê cih. Pêkhatina vê nîşanê îsbat dike ku Padîşahiya Xwedê li ezmanan hatiye saz kirin, û Îsa Mesîh êdî bûye Padîşah.

Kitêba Pîroz ji berê de gotibû ku gava Îsa Mesîh bibe Padîşah, ewê Îblîs û cinên wî ji ezmanan bavêje. Ji ber ku ew hatine avêtin ser erdê, halê dinyayê ji sala 1914an û pê ve her ku diçe xerabtir dibe (Peyxam 12:7, 9).

Halê dinyayê her çi qas xerab e jî, Îsa Mesîh – ê ku niha Padîşahê Padîşahiya Xwedê ye – alî însanan dike. Bi saya belavkirina mizgîna Padîşahiyê, gelek kes prensîpên Kitêba Pîroz hîn dibin û di jiyana xwe de pêk tînin (Îşaya 2:2-4). Bi milyonan kes hîn bûne ku gerek nêrîna wan a li ser mal û milk çawa be û ku ew çawa dikarin bextewariya malbata xwe zêde bikin. Bi ser de, tiştên bifeyde, yên ku ew niha hîn dibin, wan ji bo jiyana di bin Padîşahiya Xwedê de hazir dike.

Însanan bi hezaran salan hikum ajotiye û pir zerar daye dinyayê. Padîşahiya Xwedê wê hemû probleman safî bike û van bereketan bîne:

SIHETA BAŞ

SELAMET Û EMNIYET

DI DEMEKE NÊZIK DE, PADÎŞAHIYA XWEDÊ WÊ ÇI BIKE?

Rast e, Îsa Mesîh niha li ezmanan Padîşah e, lê dinya hê di destê hikûmetên însanan de ye. Lê belê, Xwedê ji Îsa Mesîh re wisa gotibû: “Di nav dijminên xwe de serweriyê bajo” (Zebûr 110:2). Di demeke nêzik de, Îsa Mesîh wê hemû dijminên xwe helak bike û kesên ku hazir in ku guhdariya Xwedê bikin, xelas bike.

Li wê demê, Padîşahiya Xwedê wê …

- **dîn û baweriyên sexte helak bike:** Kitêba Pîroz dînên sexte dişibîne ‘fahîşeyekê’. Dîn û baweriyên ku di heqê Xwedê de derewan belav dikin û barên giran datînin ser stûyê xelkê wê ji holê rabin. Gelek kes wê seba helakkirina van dîn û baweriyan şaşmayî bimînin (Peyxam 17:15, 16).
- **hikûmetên dinyayê ji holê rake:** Padîşahiya Xwedê wê hemû hikumdariyên însanan biqedîne (Peyxam 19:15, 17, 18).
- **mirovên xerab tune bike:** Gelo çi wê bê serê kesên ku dev ji xerabiyê bernadin û guhdariya Xwedê nakin? Kitêba Pîroz wisa dibêje: “Yên xerab [wê] ji welêt bên ajotin” (Methelokên Silêman 2:22).
- **Îblîs û cinan ji holê rake:** Îblîs û cinên wî wê êdî nikaribin ‘miletan bixapînin’ (Peyxam 20:3, 10).

Li wê demê, kesên ku Padîşahiya Xwedê qebûl dikin wê çi bereketan bistînin?

ÎŞÊN KÊFDAR

ERDEKE PAQIJ

PADÎŞAHIYA XWEDÊ WÊ ÇI BEREKETAN BÎNE?

Îsa Mesîh û 144.000 hempadîşahên wî, yên ku ji nav însanan tên hilbijartin, wê bereketên mezin bînin (Peyxam 5:9, 10; 14:1, 3). Îsa Mesîh wê daxwaza Xwedê li rûyê erdê bîne cih. Padîşahiya Xwedê wê …

- **nexweşî û mirinê tune bike:** “Yê ku li wir rûdine, dê nebêje: Ez nexweş im”, û “êdî mirin wê nebe” (Îşaya 33:24; Peyxam 21:4).
- **selamet û emniyeta rastîn bîne:** “Selameta lawên te [wê] zehf be” û ‘her kes wê di bin mêwa xwe de û di bin dara xwe ya hêjîrê de rûne, û yê ku wan bitirsîne wê tune be’ (Îşaya 54:13; Mîka 4:4).
- **îşên kêfdar tedarek bike:** “Hilbijartiyên min wê bi têra xwe ji keda destê xwe kêfê bistînin. Ewê badîhewa nexebitin” (Îşaya 65:22, 23, *NWT*).
- **problemên tebîetê safî bike:** “Dê çol û cihê şorex kêfxweş bibin û beyar kêfxweş bibe û mîna nêrgizê dê bi çîçeg bibe” (Îşaya 35:1).
- **rêyî mirovan bide ku ew çawa dikarin heta bi hetayê bijîn:** “Jiyana herheyî jî ev e: Ku ew te, tu Xwedayê bi tenê rast û Îsa Mesîhê ku te şandiye nas bikin” (Yûhenna 17:3).

Xwedê dixwaze ku tu jî van bereketan bistînî (Îşaya 48:18). Li meqaleya din, tuyê hîn bibî ku tu çawa dikarî van bereketan bi dest bixî.

Piştgiriya Padîşahiya Xwedê Bike!

Ferz bike ku firtoneyeke mezin nêzikî herêma te dibe. Dewlet îlan dike ku gerek her kes zû bireve cihekî emîn. Di halekî wisa de, teyê çi bikira? Ma tuyê neçûyayî cihekî emîn?

Îro, temamiya dinyayê ber "firtoneyeke" mezin e, a ku Îsa Mesîh wek 'tengasiya mezin' bi nav kiribû (Metta 24:21). Em helbet nikarin ji 'tengasiya mezin' birevin, lê em dikarin tiştekî bikin ji bo ku em bên parastin. Gelo çi?

Îsa Mesîh wisa gotibû: "Berî her tiştî li Padîşahiya Xwedê û li rastdariya wî bigerin" (Metta 6:33). Gelo em çawa dikarin vêya bikin?

Berî her tiştî li Padîşahiya Xwedê bigere. Gerek em ji her tiştî zêdetir bala xwe bidin Padîşahiya Xwedê (Metta 6:25, 32, 33). Gelo çima? Çimkî însan nikarin problemên dinyayê safî bikin. Tenê Padîşahiya Xwedê dikare vêya bike.

Li rastdariya wî bigere. Gerek em çi ji destê me tê bikin ku li gor qanûnên Xwedê bijîn. Eger em li gor dilê xwe bijîn, netîce wê xerab be (Methelokên Silêman 16:25). Lê eger em li gor qanûnên Xwedê bijîn, emê hem dilê Xwedê şa bikin hem jî feydeyê bibînin (Îşaya 48:17, 18).

Bi dewamî li Padîşahiya Xwedê û li rastdariya wî bigere. Îsa Mesîh gotibû ku tiştên wek mal û milk yan xemên jiyanê dikarin bibin sebeb ku hin kes bala xwe nedin Padîşahiya Xwedê (Metta 6:19-21, 25-32).

Li seranserê dinyayê, bi milyonan însan piştgiriya Padîşahiya Xwedê dikin

1 > Guh bide mizgîna Padîşahiyê

2 > Kitêba Pîroz lêkolîn bike

Lê belê, Îsa Mesîh soz daye ku hewcedariyên kesên ku piştgiriya Padîşahiya Xwedê dikin wê bên tedarek kirin, û ewê bereketên bêdawî bistînin (Metta 6:33).

Li sedsala yekê, şagirtên Îsa Mesîh ji her tiştî zêdetir li Padîşahiya Xwedê û li rastdariya wî digeriyan. Kul û derdên dinyayê di rojên wan de xelas nebûn, lê ew dîsa jî dihatin parastin. Gelo çawa?

Ji ber ku ew li gor qanûnên Xwedê dijiyan, ew ji tengasiyên ku tên serê kesên ku guh nadin Xwedê, dihatin parastin. Bi saya baweriya wan ku rojekê, Padîşahiya Xwedê wê bê, ew hazir bûn ku li hemberî hemû zehmetan li ber xwe bidin. Wekî din, Xwedê qewet dida wan, da ku ew karibin sebir bikin (2. Korîntî 4:7-9).

JI HER TIŞTÎ ZÊDETIR LI PADÎŞAHIYÊ BIGERE

Li sedsala yekê, şagirtên Îsa Mesîh mizgîna Padîşahiya Xwedê li her derê belav dikir (Kolosî 1:23). Gelo îro kesên ku vê mizgînê belav dikin hene?

Belê! Şahidên Yehowa dizanin ku di demeke nêzik de, Padîşahiya Xwedê wê vê sîstema xerab helak bike. Loma, ew xîret dikin ku van gotinên Îsa Mesîh bînin cih: “Ev Mizgîniya Padîşahiyê wê li seranserê dinyayê bê dayîn, da ku ji hemû miletan re bibe şahidî û hingê dawî wê bê” (Metta 24:14).

Gelo tu li mizgîna Padîşahiya Xwedê çawa dinêrî? Li sedsala yekê, gava mirovên li bajarê Beroyayê mizgîna Padîşahiyê bihîst, wan ev mizgîn “ji dil û can qebûl kir û her roj li ser Nivîsarên Pîroz lêkolîn kirin, ka gelo ev tişt wisa ne”. Paşê, ew li gor tiştên ku ew hîn bûne, dijiyan (Karên Şandiyan 17:11, 12).

Tu jî dikarî wisa bikî! Eger tu ji her tiştî zêdetir li Padîşahiya Xwedê û li rastdariya wî bigerî, tuyê ji gelek tengasiyan bêyî parastin, û tuyê heta bi hetayê di selamet û emniyetê de bijî.

3 > Bi piştevanên Padîşahiyê re hevaltiyê bike

4 > Nîşanî Xwedê bide ku tu dixwazî ji wî re xizmet bikî

Eger tu dixwazî di heqê fealiyetên Şahidên Yehowa de zêdetir melûmatê bistînî, ji kerema xwe re here malpera jw.org.

Li vê malperê, bi zêdetirî 1.000 zimanî melûmat heye.

PADÎŞAHIYA XWEDÊ ÇI YE?

Gelek însan dua dikin ku bila Padîşahiya Xwedê bê. Gelo Padîşahiya Xwedê çi ye, û ewê çi bike?

KA BINÊRE KU KITÊBA PÎROZ ÇI DIBÊJE:

Padîşahiya Xwedê çi ye?

Padîşahiya Xwedê, hikûmeteke li ezmanan e. Padîşahê vê hikûmetê, Îsa Mesîh e (Îşaya 9:6, 7; Metta 5:3; Lûqa 1:31-33).

Padîşahiya Xwedê wê çi bike?

Ewê xerabiyê ji holê rake û selametê bîne dinyayê (Danîêl 2:44; Metta 6:10).

Gerek em çi bikin?

Gerek em piştgiriya Padîşahiya Xwedê bikin û bawer bin ku tenê ev hikûmet dikare daxwaza Xwedê pêk bîne û halê dinyayê serrast bike (Metta 6:33; 13:44).

VÊ KITÊBÊ JI MIN RE BIŞÎNIN:

Heta Bi Hetayê Dilşad Be!

Dersa 31ê ya vê kitêbê, ya ku ji aliyê Şahidên Yehowa ve tê weşandin, di heqê Padîşahiya Xwedê de zêdetir melûmatê dide. Ev kitêb li ser **www.jw.org** jî heye.

ZIMAN _____

NAV _____

ADRES _____

_____

Adresên buroyên me li rûpela 2yan tên nîşan dayîn. Bi tijekirin û şandina vê formê, ez îznê didim Şahidên Yehowa ku ew daneyên min ên şexsî ji bo pêkanîna daxwaza min li gor Siyaseta Taybetîtiyê, ya ku li ser jw.org hatiye weşandin, bi kar bînin.

JW.ORG®

Vê kovarê û kovarên berê bê pere daxe

Kitêba Pîroz bi sedan zimanan li ser Înternetê heye

Bikeve malpera **jw.org** yan vê kodê bi kar bîne

wp20.2-RD
230313